Nordkurdiska
Vuxenutbildning

Perwerdeya kesên gihaştî

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Perwerdeyek temendirêj ji bo her kesekî
Ji bo me Sosyaldemokratan, pêdivî ye, ku her kes, bêyî rewşa çîna ku jê tê, bikaribe beşdarê perwerdeyek temendirêj (livslångt lärande) bibe. Ev pêdivî ye, heger ku Swêd wê bikaribe ji xwe re pêwîstiya hêza karkerên perwerdekirî cîbicî bike. Ji ber vê yekê em Sosyaldemokrat me derfetên mazin li ser zarokxane (förskola) û dibistana seretayî (grundskola) amade kiriye. Projeya bilindkirina zaniyariyê (kunskapslyftet) ji 800 000 mirovê re derfeta wergirtina perwerdeyî daye. Me li tevayiya welêt xwandegeha bilind (högskola) nûjen kiriye û me çar zanko û du xwendegehên nuh ava kirine. Her wisan jî me jimareya koma lêkolîneran pir bilind kiriye.

Perwerdewergirtin mafê her kesekî ye. Zanebûn gava li gelekan par bibe mazin dibe. Ji ber vê hindê em lê dixebitin, ku gelek kesên xwedî perwerdeyên nizm, dest bi xwandinê bikin. Perwerdeya ji bo sere û gihaştiyan (vuxenutbildning), ji bo kêmkirina pileya cudahiya di navbera komên civatê me pir gerek e.

Hikumeta Sosyaldemokratan her sal 1,8 milyar kron dide şaredariyan, da ku şaredarî li dor 80 000 derfetên tam ji bo perwerdeya şaredariyê ya ji bo gihaştiyan (kommunal vuxenutbildning) amade bike. Ev ciyên xwandinê, li destê pêşî ji bo wan kesên xwedî perwerdeya kurt pêşkêş dibe. Bêyî amadekirina vê derfetê, wê ji bo gihaştiyan dijwar bûya, ku ji xwe re ji nû ve dest bi xwandinê bikin.

Ji bo bêhtir bi serkarxistina wan kesên, ku xwedî perwerdeyek nizm in, em hikûmeta Sosyaldemokratan her wisan jî ji ser du milyar kronan derfeta piştgiriyek taybetmend a camêr a ji bo perwerde û xwandinê ava dikin. Ev dihê wê wateyê, ku her wisan 25 000 kesên bêkar yan jî ew kesên ku dikarin bibin bêkar, dihên şandin ji bo xwandin û

perwerdeyê bi alîkariya piştgiriya perwerdeyê, ku di nav salekê de 100% alîkarî dide van xwandekaran. Ev cûre piştgiriya perwerdeyê, ji bo kêmkirina pirsa cudabûna pileya zanebûna li navbera girseyên gelêrî pêdivîyek e.

Em Sosyaldemokrat dixwazin, ku ji bo perwerdeya pîşesaziyê (yrkesutbildning), çi li xwandina lîseyî, çi jî ji bo piştî xwandina lîseyê, derfetên nuh ava bikin. Em bernameya amadekariya ji bo pîşesaziyê (yrkesförberedande program) ya lîseyê zexm dikin. Perwerdeya bi kvalîte ya pîşesaziyê (kvalificerad yrkesutbildning) ji salê 846 beşdaran sala 1996'ê derketiye 27 000 beşdaran li sala 2005'ê. Em nuha ber bi pêş ve diherin û em dixwazin perwerdeya ji bo gihaştiyan a şaredariyê ya li ser pîşesaziyê zexm bikin. Her wek li perwerdekariya lîseyî ya ji bo ciwanan, divê kesên gihaştî jî ji xwe re bibin xwedî derfetên wekhev.

Her wisan jî em dixwazin derfetên li ser perwerdeyiya gelî (folkbildning) jî bêhtir bikin. Her sal ji ser 1,5 milyon jin û mêr beşdarê karguzeriyên kar û barên xwendinî (studieförbund) dibin. Li kursên kurt û dirêj ên xwendegeha bilind a gelî (folkhögskola) 100 000 kes dixwînin. Perwerdeyiya gelî (folkbildningen) ji bo perwerdeyek temendirêj grîng e.

Alternatîva vê
Li hevberî vê ramyariya me ya ku dibêje perwerdeyek temendirêj mafê her kesekî ye, Moderat û ew hevbendiya wan a baskê rastê dirawestin. Moderat dixwazin piştgiriya dewletî ya ji bo perwerdeya gihaştiyan kêm bikin. Ev dihê wê wateyê, ku bi kêmanî ji sisiya yek ji derfeta perwerdeyî winda dibe. Her wisan jî Moderat dixwazin ew piştgiriya perwerdeyî ya taybetmend (särskilt studiestöd) ji holê rakin, ku ev ji kesên xwande re derfeta herî bilind e, ku ew bikaribin xwandina xwe bibin serî. Moderat dixwazin piştgiriya ji bo perwerdeya gelî jî kêm bikin, ku yek ji her sê kursên perwerdeyî yên berdewamî (studiecirkel) yek were rakirinê.

Swêd divê bi zanebûnê xurt û mazin bibe. Ji bo kêmkirina pileya zaniyariyê di navbera girsên gelêrî de, riya herî baş ew e, ku em pileya civakî û aborî ya di navbera girsên gelêrî de kêm bikin. Ji ber vê hindê ye, ku em Sosyaldemokrat dixwazin ji bo perwerdeya gihaştiyên xwedî xwandinên nizm derfetên taybetî biafirînin.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?